# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (270):

## /26.5/ miliyon Dolar vêrgiyên "Ebû Emşe", lêxistin û girtina sivîlina, qutkirina darên zeytûnê, tewaneke kuştinê û teqandina matorekê


































Bi ser cersiyên ku didin dû "**Mihemed El'casêm/Ebú Emşe**" (ji dema ku destlatî û zordariya xwe li ser Bajaroka "Şiyê" û bajarok û gundine din di siya Dagîrkeriya Turkiyê de - sala 2018an. Z ferz kiriye ve), doseya wî ya tijî binpêkirin û tewanên tonbiton û cezakirina wî ji aliyê Amrîka ve...Ew hîna di kiryarên xwe de berdewam e, û qirêjiyên xwe zêde jî dike; Wî barê Kurdan -xelkê wan gund û bajaran- bi bace û vêrgiyan giran kiriye, di heman dema ku ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê ve tê parastin û şîretkirin, û ji aliyê "Hemahengiya Sûrî" - Ixwanî û Hikometa wê ya Demkî ve jî tê nixumandin.

**Ev jî hin heyîn û bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Vêrgiyên "Mihemed Hisên El'casêm/Ebû Emşe":**

Naskiriye ku "**Mihemed Hisên El'casêm/Ebû Emşe**" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" bi zorê çekan (Navça "Şiyê" û gundên pê ve girêdayî) û ( Gundên "Aşkê Xerbî, Merwaniyê Jêrin û Jorin û Hêkiçê" - Navça Cindirêsê) û (Bajarokên "Kaxrê, Birîmce, Mabeta" û gundên derdorê) destlat dike, û vêrgiyên bilind û pireng li ser werza zeytûna ferz dike; Û bi têkildariyê bi pisporên di hundir de û li gor jimariyên/bîrkariyên derdorane, tibabên pereyên li vê werzê ji xelkê standine weha ne:

**-** Berhema dora /30/guvêşgehên ku di çarçewa bandoriya wî de dora /600/hezar tenke zêt e (her yek 16 KG sade), û vêrgiya 5% (bê dandina kirê guvêşgehê û nirxa tenekê boş/vala) = /30/hezar teneke × /100/Dolar = /3/milyon Dolar Emrîkî.

**-** Hejmara darên zeytûna li wan bajarok û gundan dora /4.5/milyon dar e, xwediyên 35% jê ne li wir in = /1575000/ dar, jê 60% deştî ne= /945000/ dar × /20/Dolar = /18900000/Dolar Emrîkî, û 40% çiyayî ne= /630000/dar × /3.5/Dolar = /2205000/Dolar.

**-** Xwediyên 65% ji daran li wir in = /4.5/milyon dar × 65%= /2925000/ dar, jê 60% deştî ne = /1755000/dar× /1/Dolarî = /1755000/Dolar, û 40% jî çiyayî = /1170000/ dar × /0.25/Dolarî = /292500/Dolar Emrîkî.

**-** Bi behaneya payandinê dora /1000/teneke zêt ji wan gund û bajarokan werdigire = /100/hezar Dolar Emrîkî.

**-** Vêrgiya li ser guvêşgehan ferzkirî = /30/ × /10/hezar Dolar = /300/hezar Dolar Emrîkî.

**- Tevahiya vêrgiyan = /26.5/milyon Dolar Emrîkî** (dora bîst û şeş milyon û pêncsed hezar Dolar Emrîkî).

Û bi rengekî din agahiyin ji me re hatin: Vêrgiyên next ên li ser hin gundan ferz bûne ev bûn: (Anqelê /600/hezar Dolar, Senarê /700/hezar Dolar, Hêkiçê /550/hezar Dolar, Merwaniyê Jêrin û Jorin /400/ hezar Dolar).

Û "El'emşat" ji bo wergirtina vêrgiyan û dûdana yê dereng bimîne gefan dide xelkê, û ji ber nekanîna dandinê hin neçar dibin ku birevin, bi taybetî jî yên ku darên wan îsal negirtibûn.

**= El'emşat li Gundê "Hêkiçê":**

"El'emşat" li ser darên zeytûnê -girtî yan negirtî- yên xelkê Gundê "Hêkiçê" (42 malbatên mane) - Navça Cindirêsê vêrgiya /550/hezar Dolar ferz kir, birayê serkêşê "Firqê" "**Welîd Hisên El'casêm** (ê bi Sêf tê navdan") di civtekê de li gel hin xelkê gund şidand ku tevahiya vêrgiyê bidin û bi sezakirinê gef kirin, bê ku guh bide nerazîbûna wan an çetiniya dandinê, û bi taybetî jî ku beşek ji zeviyan îsal negirtibûn; Û bi rastî hin çekdaran ji "Firqê" mekin li hejmarek mêr xistin, ji wan jî Hemwelatî "**Fereh El'dîn Hesen Îbrahîm** /40/sal" ê

ku di biryargeha "El'emşat" de li gund rastî daxdana elektirîkê hatî, çimkî nikanîbû vêrgiya /14/hezar Dolar ên li ser malmewdanên wî û birayên wî yên ne li wir ferzkirî bide, ji ber wê jî bi seknexwînê ketî, û niha jî di nexweşxanak Efrînê de û di rewşkeke ne tendurist de raketî ye.

**= Li Gundê "Mistika":**

Li Navça "Şiyê" "El'emşat" /18/hezar Dolar Emrîkî = /20/Dolar × /900/darî zeytûnê li ser Hemwelatî "**Mihemed Mistefa Mihemed**" (yê ku wan darên koçberbûyê zorane "**Elî Qere Elî**" bi rêdankê bi rêve dibe) ferz kir, bi ser ku wan daran îsal negirtibûn, û ew neçar kir ku bide.

**= Qutkirina darên zeytûne:**

**-** Me di rapora xwe ya borî de çêra qutkirina /40/darî zeytûnê yên Parêzer "**Ebid El'qadêr Ebid El'rehman**" li Rojavayê Bajaroka "Meydankê" - Navça Şera kiribû, lê piştî çaksazkirin û dûzankirina daran, ji nû ve çekdaran piraniya bermayên wan daran qut kirin, û bi ser de jî qutkirina /60/ darî din bi piçekî; Herweha wan dora /100/darî zeytûnê yên "**Malbata Sebrî Îbo**" li cîgeheke nêzîk rêbenda çekdar a Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" li derbasgeha Rojavayê bajarokê qut kirin.

**-** "**Mihemed Hisên El'casêm**" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" avahiya ku li derbasgeha Bajaroka "Şiyê" bi behaneya vekirina nexweşxanakê hatiye vekirin guhestin biryargeheke ewlehî - leşkerî, ye ku kevirê wê yê bingehîn li 17.2.2021an. Z û bi beşdariya "Nesir El'herîrî - serokê Hemahengiya Sûrî Ixwanî" û "Selîm Idrîs - wezîrê bergiriya Hikometa Demkî ya Kiwalisyonê" û li ser zeviyeke zeytûna ye Malbata "Silêman Sofî" û jineke jinebî hatiye danîn, bê ku buhayê wê were dandin; Herweha li vê dawiyê meydanên/kastînên avahiyê fere kirin û erdên hevcîwar li aliyê Başûr dûz kirin, dora /200/darî zeytûnê yên mezin (ên kurên herdu birayên dilovanber "**Mistefa û Elî Bozîk**") ji tamaran ve hilkirin, bi ser de jî hilweşandina herdu malên "Mistefê" û kurê wî yê zorane koçberbûyî û mala "**Ferîd kurê Elî Bozîk**" - ê li bajarokê; Û darên hilkirî û êzing jî guhestin meydana avahiyeke guvêşgeha zeytûna (ya ji aletan valakirî û ji 2018an. Z ve desteserkirî) li Bakurê "Şiyê" û li ser riya Gundê "Çeqela".

**= Vekirina du gundên niştecîkirinê:**

Li 20.12.2023an. Z, du gundên "Destê Alîkariyê/Yed El'ewin" (yê yekem "**HHRD 1**" li nêzîk Gundê Keferomê - N. Şera û yê diwem jî "**HHRD 2**" li nêzîk Gundê "Xalta" - Şêrewa/Çiyayê Lêlûn) yê niştecîkirinê hatin vekirin, di her yekê de /250/ perçemal/yekîniyên nişteyî digel binevahiyên xizmetguzariyê û dibistan û mezgeftekê û dîkanan, bi palpiştiyekê/piştgieiyekê ji Rêkxirawa "Destê Alîkariyê ji bo Fîxanê û Geşepêdanê - HHRD" a Emrîkî; Û me di rapora xwe ya (259) an de - dîrok 9.9.2023an. Z çêrê kiribû.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Ji dora heyvekê ve, Hemwelatî "**Ehmed Mihemed Elî Elîko** /35/sal" ji xelkê Gundê "Dargirê" - Navça Mabeta, bi tuhmeteke çêkirî, û ta niha çarenûsa wî nediyar e.

**-** Ji bêtirî bîst rojan ve, Hemwelatî "**Mistefa Mihemed Miho** /65/sal" û hevjîna wî "**Ferîde** /60/sal" û neviyê wí "**Varîn Welîd Mistefa Miho** /12/sal", û weha jî kurê wî "**Mihemed** /23/sal" tevî hevjîna wî "**Fîdan Ebid El'rehman Mistefa** /18/ sal" û herdu zaroyên wan, ji xelkê Gundê "Hêkiçê" - Navça Cindirêsê, li ser riya vegerê ji ciyê penaberiyê - Heleb bo gundê xwe, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" ve li Derbasgeha Efrînê, û herweha jî li roja din kurê wî "**Rîfa'î Mistefa Mihemed Miho** /32/sal" (ê ku ji berê de li gund); Û "Ferîde" û "Fîdan" û zaroyên herdiwan berdan, û ta niha yên din bêsûcane girtî ne.

**-** Li 22.12.2023an. Z, Hemwelatî "Sebrî Mistefa Şaşo /65/ sal, Ehmed Mihemed Mistefa /24/sal, Beşar Mihemed kurê Mihemed /22/sal" ji xelkê Gundê "Dargirê" - Navça Mabeta, bi tuhmetên têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û ta niha bêsûcane girtî ne.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li siba 15.12.2023an. Z, termê mêrekî kuştî li nav zeviyeke zeytûna piştî çateriya Gundê "Tilifê" bi aliyê Cindirêsê ve hate dîtin, û li gor kenalên xwecihî ew term ê "**Ehmed Qedûr**" e ji anîndeyên Gundê "Me'arêt

El'etarêb" - Gundewarê Heleb a Rojava ye, û li ser nelihevkirinê bi Milîseyên "Firqit El'hemze" re li ser diziyên êzingan hatiye kuştin.

**-** Li şeva 22.12.2023an. Z, matoreke dutekerî li orta kolanê li nêzîk Gergeha "Newroz" - Bajarê Efrînê bi bombeyeke teqîner teqiya, û di encamê de ziyanin şênberî gihîştin makînan û avahiyan.

**-** Di navboriya heyva derbasbûyî de, Istîxbaratên Turkiyê û milîseyên bi ser ve seferber bûn, çavdêriya xwe ji Derbasgeha Gundê "Xezîwiyê" û riyên di navbera wê û "Kefercenê û Ezazê" de mekin kirin, da ku liv û tevgera "**Desteya Tehrîr El'şam - Ebû Mihemed El'colanî**" kontirol bikin, a ku hêzin ji ewleya xwe ya giştî bi aliyê Bajarê "Ezazê" ve livandine, û bi hevkariya giropin pêve girêdayî li şeva Sêşemê 19.12.2023an. Z bi çekên orte û giran êriş ser mala ku "**Cîhad Îse El'şêx/Ebû Ehmed Zekûr**" û birayê wî û hin din xwe tê de veşartine kiriye, û "Ebû Ehmed Zekûr" û birayê wî revandiye û bi aliyê Idlibê ve guhestiye, lê hêzeke Turkî û milîseyin pêve girêdayî li nêzîk B. Efrînê destêwerdan têde kirine, ew ji nav lepan derxistine û vegerandine Gundê "Hewar Kilis" - Ezaz, li gor kenalin ragîhandinî yen xwecihî.

Divê bê bîranîn ku "Ebû Ehmed Zekûr" di "Desteyê" de rêvebirekî berz bû, li 2.5.2023an. Z ji aliyê Emrîka ve hatibû cezakirin, û piştî nelihevkirin û nakokiyên di navêna wî û "El'colanî" de û derxistina biryara dûrxistina wî ji "Desteyê" li 3.12.2023an. Z, wî qetandina xwe li 14.12.2023an. Z ragîhand û ji "Idlibê" revî "Ezazê", û "El'colanî" û "Desteyê" bi gendeliyê û tewanê tuhmet dike, û endamê êla xwe "El'begare" jî vexwend ku li dijî "Desteyê" derkevin, a ku daneserek/hemleyeke girtinê ye fere di nav wan de pêk aniye.

Bi ser berpirsiyartiya Dagîrkeriya Turkiyê di ber rewşên ku li Herêma "Efrînê" serwerkirî de, tiştekî xweza û normal e ku "Hemahengiya/Kiwalisyona Sûrî" - Ixwanî bi hemî pêkhateyên xwe ve di wê berpirsiyartiyê de ortaq/hevpar be, nemaze di ber binpêkirin û tewanên "Ebû Emşe" de.

24.12.2023. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

---------------------------

**Wêne:**

- "Mihemed Hisên El'casêm/Ebû Emşe" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" û birayê wî "Welîd El'casêm/Sêf".
- Qutkirina darên zeytûnê li Bajaroka "Meydankê", ji du perçeyên vîdiyo, wênekirina çalakvanê ragîhandinî "Ehmed El'berho", 13.12.2023. Z.
- Avahiyeke nexweşxanê/biryargeheke ewlehî - leşkerî ye "El'emşat", hilkirina darên zeytûnê û hilweşandina sê malan li derbasgeha Bajaroka "Şiyê".
- Vekirina du gundên "Destê Alîkariyê/Yed El'ewin - yekem û diwem" ên niştecîkirinê.
- Teqandina matoreke duloqî li nêzîk Gergeha "Newroz" - Bajarê Efrînê, li Şeva 22.12.2023an. Z.
- Yê bi "Cîhad Îse El'şêx/Ebû Ehmed Zekûr" tê nasîn digel "Ebû Mihemed El'colanî".